

Alfabeya Kurdî (Latînî-Erebî)

Hüseyn Kartal (Ji bo Konferansa Zimanê Kurdî li Hewlêrê-Paytextê Kurdistan)

Naverok:

1. Destpêk
2. Alfabeyên Kurdî
 - 2.1. tîpên kevn
 - 2.2. latînî
3. Deng û tîpên alfabeya kurdî
 - 3.1. Deng
 - 3.1.1. Dengên biyanî
 - 3.2. Tîp
 - 3.2.1. Tîpên biyanî
 - 3.3. Kîfayet yan dengên cuda
4. Pirs û chareserî
 - 4.1. Pirs chi ye?
 - 4.2. Chareserî chi ye?
5. Pêshniyaz

1. Destpêk

Rewsha zimanê kurdî ne mîna rewsha zimanên din e; kurdî bi du alfabeyan¹ tê nivîsandin û ev yek cudabûneke chandî xistiye nav kurdan. Pirsgirêk axaftin nîne, nivîsandin e. Mirov dikare bi axaftin ji hev têbigihîje lê di nivîs de ji berhemên hev bêpar dimîne. Mînaka Pakistan-ûrdû û Hindistan-hindî nêzikî mînaka kurdî-latînî û tîpên kevn² yanî erebî ye. Mirov bi ûrdû zanibe hindî fam dike, bi hindî zanibe ûrdû fam dike lê di nivîs de ji hev cûda ne, nikarin berjewendiya berhemên hev werbigirin, ji ber ku ûrdû bi tîpên erebî û hindî jî bi sîstema tîpên devanagari (devanāgarī)³ tên nivîsandin. Heman tişt ji bo Azarbaycan û Kurdistanê jî derbas dibe.

Pirsgirêka tîpan ji bo nivîsê ew e ku bi hêsanî bê nivîsandin û bê famkirin. Kurdî bi du tîpan tê nivîsandin, ev jî gavekî pêş e ji ber ku berê tîpên krilî jî hebûn, niha Kurdên welatên Sovyeta berê bi latînî-kurdî dinivîsîn. Kurdên Rojavayê welat (Suriye) û Kurdên Bakûrê welat (Tirkiye) jî bi tîpên latînî-kurdî dinivîsîn. Kurdên Bashûrê welat û Rojhilatê welat jî, bi kurdî tîpên kevn (erebî) dinivîsîn. Ev yek cudabûn dixê nav Kurdan, ev cudabûneke chandî ye, ne cudabûneke giyanî û welatperwerî ye lê ev yek dîsa jî, mirovên Kurdistanê ji hev dûr dixîne, rê li ber têgihîştin û berjewendî jêgirtina berhemdariya ji hev digire, pêwendiyêke chandî⁴ asteng dike.

2. Alfabeyên Kurdî

Zimanê kurdî heta demêke nêzik bi sê⁵ alfabeyan dihat nivîsandin lê niha bi du alfabeyan tê nivîsandin⁶. Mirov dikare vê yekê wek gavekî pêshketî binirxîne. Ber bi yekbûna alfabeyekê çûn divê xwezayî pêk bê, bi zordana hestên netewî ev yek pêk nayê, bi xebateke sifte rewshenbîrî û bilindiya asta zanyariya civakê, sazî û dezgehên fermî-dewletî ev yek pêk tê. Em nikarin wisa bikin, mîna ku em xwediyê yek alfabeyê ne, du alfabeyên me yên kurdî hene û divê em di nav vê charchoveyê de li chareseriyên bigerin.

¹ Alfabe bi gelek awayan tê ziman: abeya kurdî, elîfbeya kurdî, alfabeta kurdî ûwd. Ez dixwazim li vê derê "alfabe" bi kar bînim.

² Mamoste Jemal Nebez ji bo tîpên soranî-erebî têgeha tîpên kevn bi kar tîne.

³ b. <http://de.wikipedia.org/wiki/Devanagari>

⁴ Li ser bingeha peyvê tenê mirov ji berhemên xweshnivîs yanî helbest, çîrok, roman, afirandêriya hunerên chê û zanyarî bêpar dimine.

⁵ Kurdî bi tîpên latînî-erebî-krilî dihat nivîsandin.

⁶ Niha kurdî bi latînî-kurdî tîpên kevn (erebî-kurdî) tê nivîsandin.

2.1. *tîpên kevn*

Mamoste Jemal Nebez alfabeya erebî-kurdî wek tîpên kevn bi nav dike; ez Jemal Nebez otorîteyekî beshê zarav û alfabeya Bashûrê welat dibînim û vê têgehê bi kar tînim. Di her zimanê de alfabe û deng cûda ne, alfabe ziman sedîsed naxe deng, ji ber vê yekê jî mirov ne hewce ye bikeve tengasiya nivîsandina her dengekî û alfabeya xwe bi gelek zêde xêz û tîpan bixemilîne. Di alfabeyên kurdî de zêdebûn hene lê kêmasî nînin. Alfabe kê m be, fêrbûn asantir dibe. Zimanên cîhanê yê pêshketî bi giranî bi alfabeyên ji kê m tîpan pêkhatî tên nivîsandin û pirsgirêka dengên di charchoveya hevokê de yanî bi maneya naverokê tê chareserkirin. Di piranî alfabeyan de hejmara tîpan kê m zêde li derdora 30ê ye. Di zaravê kurdî tîpên alfabeya kevin de cotetîpên ll (ﻟﻝ) û rr (ﺭﺭ) ketine zimanê kurdî⁷.

2.2. *latînî*

Alfabeya kurdî-latînî jî, ji 31 tîpan pêk tê⁸. Dengê kurdî nade der lê bi alîkariya naverokê hertishtên zimanê kurdî dikarin bê nîvîsandin û fêhmîkirin. Li seranserê Kurdistanê ev alfabe ji aliyê kesên ku xwendin û nivîsandin fêr dibin yan jî zimanekî biyanî dizanin latînî-kurdî dikare bê fêhmîkirin. Zimanên biyanî yê ku li Kurdistanê tên fêrkirin, bi giranî bi alfabeya latînî tên nivîsandin⁹.

3. *Deng û tîpên alfabeya kurdî*

Alfabeya kurdî kurdî-latînî ji van tîpan pêk tê:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Alfabeya kurdî-soranî ji van tîpan pêk tê¹⁰:

ا ب پ ت ج چ ح خ د ر ر ژ س ش ع غ ف ق ک گ ل م ن ه و و ی ئ ـ

3.1. *Deng*

Dengê zimanê kurdî nerm e û gelek zêde qirikî nîne. Cotedeng û shideyê red dike, nerm e, xwediyê ahengên mûzîkî ye. Fîtik û qirika kûr kê m e, dengê fîtikî tune. Bi diran, lêv, ezmana dev, ziman bi lêdanên kurt û nerm bi kar tê. Hin cotedeng û shide ji zimanên biyanî bi taybetî jî, ji aramî-erebî ketine zimanê kurdî.

3.1.1. *Dengên biyanî*

Dengên biyanî di kurdî de bi giranî ev deng in: cotedeng (billê, durre, seet), shide(dd, ll, rr, tt, kk û wd.), dengê (ya rastî aram, bire, nedeng) sukun ' (bi latînî hemberê ve yekê tune, erebî ة), wekî din tîpên ع û ح. غ, Ev tîp dengê biyanî ne, bi demê re û bi hin peyvên zimanên din di zimanê kurdî de bi cî bûne.

3.2. *Tîp*

Tîpên alfabeya kurdî têrî dengdariya zimanê kurdî dikin, lê di nav demê de hin peyvên biyanî ketine zimanê kurdî û bi xwe re dengên biyanî anîne, hin ji van dengên biyanî gihîstine tîpên xwe yê taybetî, mîna bi soranî deng û tîpên ll, rr, (tîpên kevn: ﻟﻝ, ﺭﺭ)

3.2.1. *Tîpên biyanî*

Tîpên biyanî di kurdî-latînî de û di tîpên kevin (kurdî-erebî) de hene, lê bikaranîna van tîpan alfabeya latînî û erebî bûne kurdî. Her ziman li gor xwe chend tîpan kê m yan zêde dike û bi vî awayî dengên xwe dixê nivîs.

3.3. *Kîfayet yan dengên cuda*

Li gor min 31 tîpen kurdî bi hin guhertinên di nav charchoveya alfabeyê de têrî zimanê kurdî hemû zaravayan dikin. Taybetiyên hin dengên dikarin bi alfabeya heyî chareser bibin. Bi

⁷ Zimanê kurdî cotetîpan red dike, ev deng biyanîyê zimanê kurdî ne.

⁸ Alfabeya bi kar tê ji aliyê Mîr Celadet Bedîrxan hatiye bikaranîn û di Hawarê de gihîstiyê tekamuliyê xwe ya roja me. Hin kes bi hin guhertinan bi kar bînin jî, ev bîngê e.

⁹ Hin mînak: îngilîzî, fransî, almanî, spanî, îtalî û wd.

¹⁰ http://de.wikipedia.org/wiki/Liste_arabisch-basierter_Alphabete

latînîzekirina¹¹ hin tîpan alfabe kêmtir û sadetir dibe. Dêvla tîpa **ç ch** dêvla **ş sh** dikare bê nivîsandin¹². Tîpa di soranî de **ll** û **rr** jî dikare ji coddengiyê bê xistin û yek herf di nav charchoveya naverokê de bê famkirin. Bi vî awayî tîpên kurdî kêmtir dibin, nivîsandin asan dibe.

4. Pirs û chareserî

Eger em pirsan rast destnîshan bikin, chareseriya wan jî asantir dibe. Li ser bingeha pirsê rawestan girîng e; gelek kes li gor xwe pirsan û sedemên wan diafirînin û dixwazin li gor dilê xwe pirs chareser bikin. Pirsan netewekê, pirsan zimanê netewekê li gor dil, hes û evîni chareser nabe. Dîtina pirsê girîng e, dibe ku chareserî demeke dûr û dirêj dixwaze, dibe ku hin pirs ne pêwîst e ku bîna chareserkirin jî, lê kifsh û dîtina girîng e. Gelek netewe piştî bûne xwedî dewlet bi dehsalan şûn ve pirsgirêkên xwe dîtine û chareser kirine. Xebateke pisporî li ser bingeha zanyarî girîng e lê têr nake, xebateke fermî-dibistanî, ya îradeya dewletî jî pêwîst e ku hin rewsh berepêsh bichin.

4.1. Pirs chi ye?

Pirsan bingehîn ew e ku kurd ji berhemên hev bê par in. Ev yek dikare bi îmkânên heyî kêmtir be jî, bê chareserkirin. Kurdên latînî dizanin nikarin tîpên kevin bixwînin û fêrkirineke gelemperî yê krudî-erebî ji bo wan karekî dijwar e, bê derfet e. Kurdên tîpên kevin dixwînin, di xwendina kurdî-latînî de zehmetî dikşînin lê dîsa jî dikarin bixwînin. fêrbûneke wane latînî bingehîn dibe ku ne gelek xurt be.

4.2. Chareserî chi ye?

Berhemên bi zaravê soranî yê bi tîpên kevin hatine nivîsandin gelek zêde ne: ev berhem hemû li gor girîngiya rojê dikarin bi latînî tîpwerger (transcription) bîna kirin. Tishtë niha girîng tîpwerger e, wergerên berhemên girîng jî dikarin di nav zaravayan de bîna chêkirin lê ev yek destpêk ne acîl e. Nivîsên bi latînî dikarin bêtir bîna fêhmkirin, ji ber ku kesên tîpên kevin dixwînin jî, bi piranî tîpên latînî dixwînin, beramber vê yekê kesên latînî dizanin û ne xwediyê perwerdeyeke taybetî ne û nikarin tîpên kevin bixwînin. Bi rêya tîpwergerê ew dikarin berjewendî ji berhemên kurdên tîpên kevin (kurdî-erebî) bigirin.

5. Pêshniyaz

Di warê zimanê kurdî de

Pircûriya alfabeyê ziman ji hev cûda dike, parchebûn dixwe nav gelê wî zimanî. Divê ji bo pêsherojê li ser alfabeyê bê rawestandin: tîpên erebî yan latînî.

Di nav her alfabeyê bi xwe de jî, pirsgirêk hene lê ne giran in. Pirsgirêka tîpan heye, pêwîst e bi zanistiya lêkolînan bê chareserkirin. Alfabeya latînî xwediyê pêsherojê ye, ezê tenê li ser wê rawestim. Li ser alfabeya kirîlî rawestan ji xwe ne pêwîst e, ji ber ku di bikaranîna de ne xwedî mane ye. Alfabeya erebî (tîpên kevn) ji bo zimanên îranî xwediyê astengiyên giran e, ji bo kurdî bi taybetî dijwar e. Pirsgirêkên alfabeya kurdî tîpên erebî gelek zêde ne. Ev mijareke din e.

Tîp divê neyên zêdekirin, chareserî di nav alfabeya heyî de bîna dîtina. Zêdekirina tîpan, girankirina rêziman bi xwe re tîne. Chareserî di nav alfabeyê de tê maneya kêmkirina tîpan jî, mînak: dêvla tîpa "**ş**" *sh*, "**ç**" *ch* du tîpên alfabeyê kêmtir dikin. Di zanistiya alfabeyê de girîng e ku xêz û nîchik yan li ser tîpan bin yan jî li bin tîpan bin. Ger hem li ser hem jî li bin tîpan xêz û nîchik bîna danîn, wêneya rastnivîsê tevlihev dibe. Ji dervayê chend mînakên alfabeyên mîna zimanên fransî, tirkî û kurdî, alfabeyên zimanên din piranî sernichik yan jî bixîzîk in. Hin kes li ser "**k**" nerm û "**k**" stûr serê xwe dêshînin. Pirsgirêk ne tenê "**k**" ye (mînak: ker-heywan / ker-kesê (kher) guhgiran; kêr-chaqu, kêr-feyde, kêr-kêrî), herwiha tîpên "**t**, **r**, **ç**" ûwd. din jî hene. Chareserî di nav tîpan de dikare wisa be ku ew tîpên bi lertz bi "**h**" bîna bilêvkirin, mîna: "**th**, **kh**, **rh**" lê ji ber ku gotinên wisa ne zêde ne, mirov dikare mîna awarte bipejirîne û dest nede wan. Dubare nivîsandina tîpan bi hev re li muzîka zimanê kurdî nayê; gava du tîpên wekhev bîna cem hev, divê yek ji wan bikeve, neyê nivîsandin.

Di nivîsandina peyvên biyanî de jî, gelek pirsgirêk hene, ne bingehîn in; mîna gotinên latînî yê bi tîpa "**k**" pircaran bi tîpa "**q**" tîna nivîsandin. Divê bingeha tîpên biyanî mîna xwe bimînin lê bi awazê

¹¹ "Paşeroj dê wê biryarê bide ka kîjan alfabe dê bê hilbijartin. Eger problem ji aliyê zanistiyê ve bê temaşe kirin, latînî ji hemûyan baştir e." Marîf Xeznedar, Mêjûya danîna alfabeya zimanê kurdî - info@kulturname.com

¹² Mamoste Jemal Nebez, Îsmet Sherîf Wanlî û hin zanayên ewropî yê li ser zimanê kurdî xebat kirine guhertina tîpên bi kumik jî pêshniyaz dikin: **i=ie / ê=ee / û=ou**.

rêzimanê kurdî bèn bilêvkerin. (polîtîka, komîte, kadro, kapîtalîzm, fabrîke, demokrasî, burokrasî, autokrasî, kamyon, kompîter, kopî, Klinton ûwd.)


Di warê chandî de:

1. Tîpwergera berhemên girîng û pêwîst ji hemû zaraveyan
2. Tîpwergera hemû berhemên ji tîpên kevin bi latînî
3. Wergera hin berhemên girîng û pêwîst ji zaraveyan

Wekî din:

1. Amadekirina komîsyoneke pisporî ji hemû zaraveyên kurdî û beshkirina wan di nav komikên xebatan, di charchoveya saziyeke zanistî de. Komik teng bin, xebat chêtir dimeshe.
2. Avakirina akademiyeke zimanê kurdî; bi beshên xwe yên zaraveyên cûrbicûr. Ev yek dikare bi serê xwe be û beshên wî di charchoveya zanîngehên Kurdistanê de bèn bicîhkirin.
3. Biryara hîn girîngîpêdana fêrkirina tîpên kurdî-latînî ji dibistanên seretayî heta zanîngehan.
4. Rê li ber xebatên kesane vekirin: wezîfedarkirin û di hin beshan de xebat daxwaz kirin. Gelek akademîsyenên kurd hene vala ne, ne xwediyê kar in, ew dikarin li ser bîngeha xebatên bi formên profesyonel kar bikin, lêkolînan amade bikin.
5. Rê li ber sazî û dezgehên lêkolîner û lêkolînên stratejîk vekirin, alîkarî û derfeta xebatê amadekirin.
6. Pêwendî û veguherîna zanyariyê bi cîhanê re, têkilî bi akademîsyenên kurd û ne kurd.
7. Amadekirina kovareke pîsheyî ji bo zimanê kurdî bi hemû zaraveyan.
8. Medya kurdî dikare li gor asta gel zemînekî gengêshî û têkiliyê veke, pirsra zimanê kurdî bi zaraveyan di rojevê de bihêle.

Kîjan zarava li kuderê!



Ji înternetê